



*Welat* **21**  
1/06/2015  
Candî - Giştî - Serbixwe



# Welat



Kovara **WELAT**  
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:  
**Aras Yûsiv**

Desteya rêvebir:  
**Xweşnav Heso**  
**Mihemed Zekî Mihemed**

Dizayner:  
**Hesen Berzencî**

**Têbînî:** mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



## Îdî bi azadî em alên xwe bilind dikin

**Aras Yûsiv**

2

**C**ihê vehesiyê ye ku em di vê dema cêwaz de bi şewazeke azad îdî bi serbestî alên xwe yên rengîn bilind dikin, li ser her devereke, malên xwe, nav bazarê û jorî bîroyên rêzanî.

Wek xewnekê bû ji me re-wek Kurdên Rojavayê Kurdistanê-ta berî sê salan, lê bi helweşana rêjîma destelat a ku her tiştên xweş û hêvîdar bînpê dikir û her omîdek watedat dîl û blindest dikir, roj bi roj ewrên sitemkariyê dûr dikevin ji ezmanê welatê me, û hêviyên me bi cih dibin, ew xewnên qedexekirî, û nîgarên veşartî di nava rûpelên dîroka blindest de, vaye îdî bi azadî dîwar û dergehên dibistanan şad dibin bi hilgirtina alên me yên rengîn, û ezman bi rengê keskesorê tête xemilandin.

Ew rojên serhildanê îdî xwe nû dikin, û simbolên berxwedêran vaye berdst bûye, vaye zarokên Kurda her sibehê di bin saya alaên Kurdî de sirûdê dibêjin, guman tune ye ku ev in ew gavên wendayî ji jiyana piraniya xelkên me, ên

ku bi hesreta dîtina van alan bûn û di binê zindanan de li ser dîwarên tirsê wênyê azadiyê saz dikirin ji hêsir û xwînê.

Vaye îdî em bi rengên buharî dijîn û dimînin, û li nava sitêrkan e ciwantiyên alên me, bila aştî û aramî ji para tevaya militant be, û ji azadiyê tu kes bêpar nemîne. ■

تَبَنِّي ثَوْرَةَ  
adopt a revolution



## الهجرة والشبح المخيف .. أزمات خانقة ومستقبل مجهول

جوان تتر / قامشلو

المجهر، سنرى آثاراً سلبية شخصية أكثر مما يلحق المجتمع، فالمهاجر يتعرض إلى أزمات نفسية حادة ناجمة عن تغيّر في نمط الحياة التي كان يعيشها والتي كان منصهراً فيها، يضطر إلى التعامل مع أنماط جديدة من العلاقات الاجتماعية ونوع معين من الروتين اليومي كما أنّ هناك موضوع الاندماج مع المجتمع الغربي الذي كثيراً ما يرفض اندماج المهاجر الوافد ضمن مجتمعه والنتيجة طبعاً انعدام ثقة المهاجر بنفسه وبقدراته التي كان قد اكتسبها في بلده وأغلب الأحيان يتعرض المهاجر إلى نوع من الانعزال والتفوق على ذاته والحزن الذي بداخله إلى بلده، في رأيي الآثار التي تكلمت عنها قبل قليل تؤدي في النهاية إلى دمار الشباب المهاجر وإلى صعوبة العودة إلى ما كانوا عليه سابقاً من نشاط.

الهجرة من مدينة قامشلو ليست جديدة، بل لها تاريخ قديم يمتد إلى سنوات قديمة وبطريقة ممنهجة من قبل النظام السوري وأجهزته الأمنية في سبيل إفراغ المناطق الكردية من شبابها وطمس المعالم التي تتميز بها هذه المنطقة كفعل سياسي يفقد من خلاله الكرد كافة حقوقهم الطبيعية، ولكن منذ اندلاع الثورة السورية وانتشار الفوضى في البلاد وانعدام فرص العمل وفرص استكمال الدراسة بالنسبة للشباب والأزمات الاقتصادية التي أثقلت كاهل الشعب، بات الجميع يتطلع بقوة إلى محاولات الهجرة أملاً في العثور على حياة جديدة ومط عيش يوفّر لهم الكرامة وقسطاً من الحرية، ماهي الإجراءات التي ستحد من هجرة الشباب بهذا الكم المخيف والمرّوع؟ وماهي تسهيلات السلطات القائمة لمنع الشباب من التفكير في مسألة الهجرة؟ وماهي الطرق والوسائل التي من المفترض أن يتم التفكير بها بجدية لمنع هذه الهجرة التي تشل حركة المجتمع؟ أسئلة برسم السلطات القائمة التي يتوجّب عليها أن تحرك وتوفّر كل ما يمكن أن يوقّف هذه الظاهرة التي بدأت تلوح بالخطر على كافة نواحي المجتمع.

**الهجرة** باتت من أهمّ المواضيع التي يتم مناقشتها عبر وسائل الإعلام السورية منذ اندلاع الثورة وحتى هذه اللحظة دوّمنا منازع، والحديث غالباً ما يكون متمحوراً حول الآثار التي من الممكن أن يتعرض لها المجتمع دون إغفال حاجة المجتمع الشديدة لمن يهاجرون من الشباب وإلى خبراتهم وبالضبط في مثل هكذا ظروف قاهرة، الأسباب معروفة، حرب دائرة وجهات متنازعة داخل كل المناطق السورية، أزمة اقتصادية تخنق البلاد وما من بؤادر حلّ يشمل كل السوريين وينقذهم من الصّيع، يقول السيد محمّد الحسو وهو أب لثلاثة شبّان هاجروا القامشلي تبعاً: "لم يكن أمامي غير هذا الخيار، ابني الأكبر طالب جامعي في دمشق ولا يستطيع السفر لاستكمال دراسته بسبب الأوضاع الأمنية السيئة وابني الأوسط كان يعمل في محلّ لبيع الأحذية ولكن قرار التجنيد الصادر مؤخراً ألزمه فعود البيت وإيقاف عمله، كما أنّ ابني الأصغر ضاقت السبل بدراسته فاضطرّ للالتحاق بأخويه، من المؤكّد نحن لا نريد لأبنائنا أن يغادروا إلى بلدان غريبة، ولكن ضيق ذات اليد يجبرنا أحياناً على فعل المزيد من الأخطاء، المجتمع بحاجة وهذا كلام صحيح، ولكننا نطالب كذلك المجتمع السياسي على الأخصّ بمد يد العون إلينا كي لا نغادر بلادنا إلى بلاد الغربة."

شوارع المدينة خالية، هجرة تزداد من قبل الشباب الكردي ليضيع في غياهب البلدان الغريبة التي تستقبلهم ولكن بخطى وثيدة، إقامات مؤقتة للبعض والبعض الآخر يفقد حياته بسبب الظروف السيئة التي تلازم الهجرة غير الشرعية، يقول وائل حسن: "أنا حالياً أعد نفسي وأبيع كل ما أملكه كي أهاجر وأخرج من هذه الدوامة التي من الواضح والجلي أنّها ستطول، المستقبل يضيع أمام أعيننا ونحن لسنا بقادرين على فعل أي شيء ينقذنا من هذا السراب الذي نعيشه يومياً"

كثرت في الآونة الأخير دعوات مناهضة للحد من الهجرة عبر وسائل الإعلام البديل المنتشرة، وهذه الدعوات تركز فقط على الآثار السلبية للهجرة، يقول السيد هوزان أحمي وهو مرشد اجتماعي: "يتوجّب علينا قبل أن نركّز على الآثار السلبية للهجرة وللحلم الكثير حول تلك الآثار التي باتت الجميع يعرف خطورتها، لا بدّ أن نسلط الضوء على ما يصطدم به المهاجر في البلاد الأخرى، هذا الأمر بالغ الخطورة إن نظرنا إليه بعين



## العنف الأسري ضد الأطفال

كمره أيو

إلى أمدٍ غير بعيد كان من المعتقد الذين يعيشون ضمن أسرهم أنهم يتمتعون ببيئة جيدة و آمنة،و كان الحديث عن الأوضاع الصعبة للأطفال مرتبطاً على الأغلب بانهيار الأسرة أو تفككها.

لكن هذا الاعتقاد تغيّر بشكلٍ جذري منذ نهاية ستينات القرن المنصرم،حيث بدأت الأبحاث عن موضوع العنف ضد الأطفال في المنازل تُظهر صورة مُعاكسة،فكما نعلم أن معظم دول العالم قد قامت بالتوقيع على اتفاقية حقوق الطفل التي تكفل للطفل أن يتمتع بحقه في الأمن و النمو النفسي و الجسدي السليمين،و أن يكون جسده مُصاناً بقوة الدولة و المؤسسات الاجتماعية المختلفة.

إلا أنه في الحياة الواقعية فأن موقف الطفل يختلف عن هذا اختلافاً جذرياً في بلدان العالم المختلفة و على العموم يمكن القول أن عالم الراشدين لم يتقبل بعد بشكلٍ كافٍ و لم يعترف أن الطفل إنسان له حقوقٌ محدودة.

إن مشكلات الأطفال مازالت غالباً تُدرك و تُبحث من وجهة نظر حاجات الآباء،فيعامل الطفل أحياناً على أنه دميته الصغيرة أو أنه دعم لهم،أو مجرد يد عاملة إذ لربما ضمانته لتأمين حياة أبوية في الكبر. و مازال الكبار يتناسون في غالب الأحيان أن للطفل الحق في أن يعيش طفولته و أن يتمتع بها،و أن له الحق في أن يكون محبوباً كما هو،و ليس كما يريد له الآخرون أن يكونه،و يمكن لنا أن نُميّز عدة أشكال من العنف الأسري الموجه ضد الأطفال:

أولها:هو العنف اللفظي و الذي يتجلى في استخدام الكلمات التي تجرح و تقلل من قيمة الطفل كالشتائم و السخرية أو التهديدات المختلفة.

ثانيها: هو العنف الجسدي الذي قد يصل إلى شدات عالية و التي قد تصل إلى حد إيذاء الطفل بإعاقات دائمة،و بالتالي العنف الجسدي الموجه للأطفال مازال يثير بعض نقاط سوء الفهم و خاصة أن العديد من الناس مازالوا يعتقدون أن الأبوين ليس لهما فقط

الحق لكن عليهما واجب استخدام العقاب الجسدي حيال أطفالهم ليحسنوا تربيتهم.

ثالثها:هو اهمال لهم و عدم الاهتمام بهم من جهة والديهم،و هو ما يشكل تخلياً من الأبوين عن واجبهما الأبوية كما هو متعارف عليه في الأعراف الاجتماعية السائدة في مجتمع ما.

و يمكن للإهمال أن يكون:

فيزيائياً: و الذي يتضمن الامتناع أو اهمال تقديم الرعاية الصحية اللازمة للطفل(كاللقاحات-معالجة الأسنان)،هجر الطفل و التخلي عنه،طرده من البيت أو رفض البحث عنه و محاولة إعادته إلى البيت عند هروبه منه، أو تقديم النصائح المضللة له قصداً.

تربوياً: حيث يتضمن السماح أو السكوت عن غياب الطفل المتكرر عن المدرسة بدون عذر،التساهل أو عدم الحاق الطفل في سن التعليم الإلزامي بالمدرسة.

و لربما يكون نفسياً: ليتضمن أفعالاً من نوع الامتناع عن توجيه الانتباه و الاهتمام للطفل و حاجاته و عدم تأمين الأمن الكافي له حين يُقدم آخرون على أذيته(الأخوة أو رفاق الحي أو زملاء المدرسة)،الشجارات الزوجية في حضور الطفل،و السماح بتعاطي الطفل للكحول أو المخدرات أو التدخين دون بذل أي جهد لمنعها و نصحه.

و بالتالي يكون للعنف الأسري على الطفل تأثيرات خطيرة سواء عاجلة أو آجلة تؤدي إلى درجات مَرَضِيَّة خطيرة. ■

**Hate cengê****Nûşîn Bêcirmanî**

Vê dilberê dil herifand  
Yek rim ji çava lê kişand  
yekser bi ar wê laş kewand  
çibkim ji van çavên xedar

çav hatne cengê b,dav û tîr  
ê ku xwe girt ew bûye mîr  
naçim tu cari ji hiş û bîr  
mîr im ji dêman re siwar

dilber şevêk damin û çû  
çilo revand dil birye kû  
tenê dizanim roj e rû  
dil vegeerê dilber hewar!!

nadim tu car dil yê min e  
zulfa ji nû kir çin çin e  
rim werkirin ev yar kin e  
ew hate cengê bê hedar

yek maç ji lêvê qet neda  
çibkim di cengê hey xweda  
wê dil dixwest mi can jî da  
ji nû dida min bax û dar

lêva te meyxana min e  
derya te yarê bê bin e  
hahoo.. delalê ev çin e  
ji reh birîm ew bûye war

dengê te xef hat roj hilat  
ronya te dabû nav welat  
şewqê dida birc û xelat  
ji wî devî mey hate xwar ■

**Dayê****Kovan Kenho**

Xewa şeva lite bi hisret bû ji bû me  
Çende çavê te mane şiyar jibo razaname  
Dayê liber destê tee m mezin bûn û bigermiya dilêt em  
dihatîn parastin

Dayê dengê mi ket ji girî

Hêstirê cava ziwabûn

Ez ser û bin di hejim

Her der liber çavê me reş dibê

Ronî namênê

Buxçê jiyanimin dihilweşê

Hêviyê min reşdibê

Digirîm û girî bemire digirî

Dil dimînê şkestî

Bêrya te dikim dayê

Kati dayê

Dayê ti kaniya hêviyê bû

Çende te êş û nalîn liser me dîtin dayê

Ti der mane birîna me bû

Ka ew rojê li ber dilê me weke dawet û dîlan

Dayê ti hemû hêviyê me bû

Liher demî

Dayê ti gula sibihê bû

Dayê dil dikelê

Bi bêhnateyi xwş em geş dibûn

Lê piştî te dayê em dicer misin dayê

Ti helbest û awaza me yi şêrîn bû dayê

Ti nîşana ferehîyê bû

Ti kaniya zelal bû dayê

Ti mûma me bû bişev

Ti xwşiya jiyana me bû ti sebir û hedana me bû

Xweda dayikaminî delal bi bihiştê xwe şah bika ■

## Hevdîtinek bi helbestvana Kurd

### Narîn Omer re.

Fener Ehmed



**M**amoste tu bi xêr hatî, hêviya me ew tu xwe bi xwênerên Kovara Welat bidî nasîn?

- Narîn omer sêrdîn, li Dêrka hemko ji dayîk bû me .

Ji pirtûkxane ya malbatê ya civakî, çandî, welat parezî û netew perwerî raman û hestên xwe bi keys û fesal kirine ji bûyî hezkirina xwe ya bê dawî ji bajarê xwe “ Dêrikê “ re,

Ez dayîkê ji sisê zarokan re (Dastan, Sazîn û Şêrîn).

**2- Li ser Xwendin û jîyana xwe ya civakî çi di bêjî?**

Min hemo pêvajoyên xwendina xwe weke yên jiyana xwe li Dêrikê derbas kirine, pişt re min berê xwe da şamê ‘ paytexta sûryê û li wê dê xwendina xwe ya bilind bi domahî kir di “beşê zimanê erebî de” û ta niha ez bi karê mamostetiya yê di rabim di dibistanên bajarê xwe da.

Ji piçûkaniya xwe ve bi karê civakî, çandî û wêjeyî ve mijûl di bûm, xwe fêrî zimanê xwe yê kurdî kir, û bi bandora helbest, stran, çîrok, cîvanok û serpêhatiyên gelê xwe, cvak û milletê xwe mezin bûme, ev tişt di hest û ramanin mên da hatin çandin.

Di mezinbûna temenê xwe re min pêûs û pirtûk weke heval û hogir ji xwe re dîtin, û ez her dem di bêjim ku pêûsa min hevala min ya herî dil soze di xweşî û reşî yê de.

Ez pir bi doza jinê û mafên zarokan mijûl dibim.

**3- Mamoste tu dikarî ji me re li ser pirojeyên xwe yên pêşerojê baxivî?**

Bi rastî pirojeyê min pirên , hi ber kû az xwe dibînêm weko xizmet kar ji gel û civaka xwe re , û dibînêm ti ccudabûn di nav bera çek û pêûsê de nine .

Ez hêj xwe şagirtekî biçûk di dibistana xaka û çanda gelê xwe de dibînim.

Bêtirî “15 “ pirtûkên min hîn weke dest nivîs li benda çapkirinê û weşandinê ne “ helbestên simînarên civakî û konevanî “.

Min bi dehan helbestên xwe dan hunermend û stran bêjên kurd yên Dêrikê û derveyî Dêrikê, mîna ( Cimal Sevdûn, Ronî Cezrawî, Azad Feqe, Ciwan Sebrî, Kemal Ebdil Kerîm, Berbend Simê, Dilo Doxan, Adil hiznî ).

Heta niha du pirtûkê min hatine çap kirin û weşandin “ Hinga bê dengî can dikêşê “ helbest bi zimanê erebî “ perîxana min “ helbest bi zimanê kurdî .

**4- Wek ku em di zanin te gelek xelat wergirtine, tu dikarî ji me re li wan baxivî?**

Belê min çend xelat û bawername wergirtine, ew jî evin:

1. Xelata Seydayê Tîrêj.
2. Xelata rêxistina jinê ya partiya yekîtiya demokrat a kurdî li sûryê (yekîti).

3. Xelata partî dîmoqrati el kurdî li sûrya ( elpartî ) pdk-s.
4. Xelata Mela Ehmedê Palo ji aliyê hevbenda nivîskar û rojnamevamên kurd li Sûryê.
5. Bawernameya (tîpa Dêrikê) ya hunerî.
6. Xelata malpera dil jan ya eliktironî.
7. Xelata “yekîtiya jinên kurdistana sûriya».
8. Xelata siyemîn ya çirokê bi zimanê erebî ji (dar el udabaa al seqafiye).
9. Xelata mihrecana helbesta kurdî ya (19) an.

**-Ez bi navê xwe û hemo karmendê dezgeha Welat a ragihandin,spasiya te di kim û hêviya serkeftênê ji te re di kim.**

**Gelek spas. ■**



## Hevpeyvîn bi nivîskar û lîkolînerê kurd ê ekadîmî

### Dr. Azad Ehmed Elî re.

Dijar Seyda

**D**r. Azad Ehmed Elî, xwedî dîrokeke dûr û dirêje, di warê xizmetguzariya ziman, dîrok, çand û rewşenbîriya kurdî de, bi şewekî akadîmî.

Bi dehan nivîser û lîkolîn di Kovar û Rojnameyên tîvel de belavkirine, ji pirtûkên wî romana (Yên perîşan, Berxikê kesk) û pirtûka

(انماط العمارة الطينية في الجزيرة الفراتية....).

**pirs1- Bi navê Kovara Welat, em bi xêr hatina te dikin cihê bexteweriyê ye ku te hinek ji dema xwe da me, hêviya me ewe ku tu bi xwênerên Welat bidî nasînê?**

Bersiv: gelekî sipasîya we dikim. Ez karim tenê tiştekî divî warî de bêjim, ez fêr û perwede bûme li ser hejêkirina Milet û Welatê xwe, xîza stûr di jiyana min de, xizmeta Kurd û Kurdistanê bû û dê bimîne, lê min xwest di warê çande û zanistiyê pirtir ku di warê rêxistinî û partîtiyê de wê xebatê bikim. Heger min şaşîti kiribin ji ber vê hezkirin û evîna dijwar bû. Dîsa ez di warê xebata zanistî, çandeyî û ragihandinê de berdewamim.

**pirs2- Yekemîn roman bi zimanê kurdî li sûryê bi navê (Yên Perîşan) te nivîsiye, paşê romana (Berxikê Kesk), gelo berê Romana kurdî li Sûryê bi kû ve ye, paşroja zimên û toreya kurdî çawa dinirxîni?**

Bersiv: xwendin li nav me Kurdan berê kêr bû, niha hîn kêmtir dibe, ji ber vê hoyelê suberoja wêjeya kurdî ne başe diyar dibe... xwendin û nivîsîna toreyî bihev ve girêdaye, ango heger xwendin pir bû, dibe wêje û roman jî li pêş bikeve... rewşa îroyîn ne alîkare ji bo aferandin, nivîsîn û belavkirina romanên kurdî. Alîyên serekî di jiyana kurdên rojavayî Kurdistanê têr



nebûne, lewra xwendin û nivîsandin bigiştî dê li paş bikeve.

**pirs3- gelek gotar û lîkolînên te bi zimanê kurdî hebûn, ev demeke tu ji nivîsandina kurdî dûrketî yî, gelo sedem çi ye?**

Bersiv: na ez carna pêdiviyê dibînim ku bi Erebi binivîsim ji ber naverok zanistîye kûr, wek lîkolînên Endazyarî, yan jî ji bo xwendevanê Erebi têtbigihin, wek me li ser Kobanê demek bûrî bi erebî nivîsand, herweha ez dê hewil bidim lîkolînên zanistî bi kurdî binivîsim, ji ber lîkolîn bi kurdî demek dirêj dixwaze, me gavin nû di vê rêgeyê avêtine, wek nimûne lîkolîna ( Şengal Rûgeh û Mertala Kurdistanê) bi zimanê kurdî, berî çend hevtîyan li Rûdaw hat belav kirin...

**pirs4- Pirtûk û vekolînên te yên nirxdar bi zimanê Erebi, li ser avahiyên pêşîn (yên xwelî) li cizîrê, ji bilî berçavkirin û diyarkirin rola gelê kurd ya berz û bilind di avakirina şaristaniya deverê de, armanc ji wan çi ye?**







Bersiv: diyare min dixwest wek gelek nivîserên kurd li Sûriye,ku bizimanê zanistî em berevaniye doz û kêşeya kurdî bikin,ji alîyek din ve,min kar û xwendina xwe yê akadimî dikir,lê bi armanca raskirina dîroka derverê,û çak kirina wêneya ku ji gelê kurd re bixerabî hatî çêkirin bête guherandin,û beşdarîyê di guhertina dîmenê deselaatê çêkirî bikin. Em di vê bizavê de,hinekî bi ser ketin,me gelek gotar weşandin,xasime li ser rûperên kovara Elhiwar de.

**pirs5- Ev bêtirî bîst salna tu di Kovara (El-hiwar)de dixebitî,ta vê rojê jî tu sernivîserê Kovarê yî,gelo kovara (El-hiwar) di piratîkê de,diruşma xwe ya ji bo geşkirin û gurkirina gotûbêja Erebi-Kurdî, çi gav avêtin,ta çi radeyê jî sûdar bû?**

Bersiv: kovara ElHiwar ezmûn û diyardek rewşenbîrî û siyasî bû,wek gelek pespor û çavdêr binav dikin... belê kî vegere wan (66) hejmarên wê,û rola wê bişopîne,dê bigehêje rastiya karîgerî û ektîv bûna wê kovarê,supas ji hemî biraderên alîgirîya wê kirîn çi binivîsandinê çi jî bibelavkirinê.

**pirs6- Em te spas dikin li ser vê derfeta ku te da kovara me,gotina te ya dawî ji xwêneran re çiye?**

Bersiv:Ez serkevtinê ji karê were dixwazim, hêvîdikim kovara Welat li pêşbikeve û berdewam bibe, herweha berxwedana we li hemî deverên rojavayî kurdistanê pîroz dikim. herdem xwendevan, ronakbîr û kurd perwerbin. ■



## Taxa Xeraba paşguhxiştî maye

### Lawikê Romî

**B**ajara Serê Kaniyê, ji derbasbûna meha Gulanê ve gelek astengiyan dibîne ji hêla paqijiyê de, bi taybetî taxa Xeraba, yak u tê naskirin wek kevintirîn taxên bajar.

Taxa Xeraba ya ku piraniya xelkên wê Kurd in, ji hêla paqijiyê ve paşguhxiştî maye û kêmbaldarî ji hêla şaredariyê li wê deverê tê kirin, sedem jî ewe ku Şaredariya Serê Kaniyê bêtir baldariyê dide riya bazarê û hin taxên xwiya li bajêr.

Di vê derbarê de, welatî Ehmed Ismayil, ku yek ji xelkên vê taxê bi kovara Welat wilo got:

"Şaredariya bajêr kolanan paqijî dikin û baldariyê li bazarê dikin, lê mixabin ev taxa me bêpar e ji baldariya wan û em her wek berê mane, careka din em li paşguh mayî ne!"

Û ji hêla xwe ve jî, Diya Ciwan, ku ew jî ji xelkên taxa Xeraba ye, li ser vê mijarê wisa axivî:

"Qaşo şaredariyê fermanek derxist ku gemara bajêr îdî neye avêjtin li rex vê taxê, ku bibin dever dûr ji malan, lê mixabin hîn jî gemara bajêr tê avêjtin li rex malên Xeraba, bêtir ku kesek karibe vî karê na rewa rawestîne, û hîn jî gelek gemar

tê avêtin li ber malên me, ji hêla xelkê taxên dîtir!"

Hêjayî gotinê ye ku mehên germahiyê hin bi hin ewê were, û wek ev diyarde dê gelek ziyanan bafirîne li ser xelkên bajêr bi tevayî, wek nexweşiyê laş û belavbûna bêhna genî, tevî dûmana şewtandina naylon û gemarê ku li rex malên taxa Xeraba pêk tê, bêtir ku yek hêlek berpîrs li ser vî tiştî bi rastî raweste û vê êşê ji kok serast bike.

Ma gelo ewê taxa Xeraba ta kengî paşguhxiştî bimîne?, ma ew jî ne yek ji erkên şaredariyê ye? Evan pîrsa em dê radestê saziyên berpîrs bikin, û berdestê şaredariya bajêr jî, belkî cihê baldariyê bibe û îdî xelkên bajêr bêtirs ji nexweşiyên jiyana xwe berdeham bikin. ■





## Hunera ciwankî biçûk di jiyaneke zehmet de.

Gulal Liyanî

A stengên Jiyanên û rewşa zehmet li herêmên kurdî li Sûryê nikaîbû li pêşiyê kesên pêşmend û şehreza bi sekine,wek nigarkêşê biçûk Mihemed Merî'ê ji gundê Şelal,ku temenê wî 14 sal in, ev du sal in ku bi hunera xwe êş û azarên miletê xwe bi tabloyan dinexşîne, li gorî Mihemed diyar kir ku ew ji biçûkaniya xwe ve bi omîd bû, ku bibe nîgarkêşî mezin li seranserî cîhanê bi navdarî we re nasîn, herwha got: Nivîskar û rojnemevan bi riya pênuşa xwe xebatê dikin, ez dixwazim di riya hunera xwe re êşa miltê xwe pêkêşî civakê û cîhanê bikim. Folklor û kevnetorê kurdî bandora xwe li hunra Mihemed kiriye, gelek tabloyên wî li ser cil û bergan û li ser karmedê kurd yê kevnar dema di dema kar de, herwha wêneyên serok û navdarên gelê kurd jî nîgarkirine. Hêjayî gotinê ye ku tabloyên Mihemed di du pêşengihan de hatine darîçavkirin yek li bajarê Qamişlo û yek li bajarê Dêrik ji hêla tevgera ciwanên kurd ve. Bi sedan kesên pêşmend û zana di nav civaka kurdî de peyda dibin lê mixabin tu rêxistin yan komele yên taybet li wan xwedî dernakevin. ■



## Radyoyên xwecehî li Qamişlo

Xunav Kano

**L**i hemû welatên cîhanê, çapemenî desthilata çaremîn e, çapemeniya bi hemû cûreyên xwe, ya nerênî an guhdarî ango nîviskî be, ew ragihandin roleke sereke di diyarkirina rewşa welatekî dike, nemaze ku ew welat di bin şerekî de be, û li bajarêkî weke bajarê Qamişlo, gellek dezgeh û saziyên taybet bi ragihandinê di hersî salên dawî de vebûn, Bêhtirî wan dezgehên ragihîner taybet in bi ragihandina nîviskî û ya guhdarî, ji wan rojname û kovar û radyo hene, herweha piştî şoreşa Sûryê gellek kesên ne pispör derbasî xêza çapemeniyê bûn, û dest bi wî karî kirin, ev dezgeh bi zimanê Kurmancî û yê Erebî diaxivin, û piraniya karmendên wan ciwanên Kurd in, bitaybetî ku ev 5 sal rewşa elektrîka Sûryê xerab e, herwisa radyo weke cûreyekî ji ragihandinê dest bi weşanê kiriye, hin radyo navenda wan li bajêr e, û hin din jî li bajarin din kar dikin, lê li Qamişlo tîn weşandin... Hin ji wan radyoyan yê partiyan e û hin jî serbixwe ne, ev radyo mijarên rengereng pêşkêş dikin, nûçe û civak û siyaset û aborî û jin û gellek mijarin din... Radyoya CUDÎ ji bajarê Qamişlo tê weşandin, û li hin bajarên din yê Rojavayê Kurdistanê jî belav dibe... Ew di 15-10-2012 an de hat damezirandin, û yekemîn radyo bû ku li Rojavayê Kurdistanê tê vekirin, herweha piştî wê demê gellek radyoyên din vebûn, Radyoya ARTA jî li Qamişlo kar dike, navenda wê li bajarê Amûdê ye, herweha navendên wê li bajarên din yê Rojava Kurdistanê jî hene, karmendê Arta Fm



li bajarê Qamişlo “Saad Zoro” behsa radyoya Arta jî kovara Welat re kir û wiha axift:

Radyoya Arta di 6 heyva 7 sala 2013 an de hatiye

avakirin, ew li pênc bajarên tê weşandin ji Serê kaniyê, Qamişlo, Amûdê, Dêrikê, û Heseke, herweha navenda radyo

li Kobanê jî heye lê ji ber hin sedemên girêdayî bi rêvebiriya xweserî ew hatiye girtin, nêzî 11 bername di radyo de hene, ew cûrbecûr in li ser civak û siyaset û filklor û çandê diseknin, peyama me di ragihandinê de ewe ku em hemû tiştên ku li navçeya me çêdibin ji cîhanê re ragihînin, nêzî 84 karmendan tede kar dikin”...

“Zoro” da zanîn ku radyoya Arta bi çar zimanan tê weşandin û ew ziman ev in” Kurdî, Erebî, Sîryanî, û Ermenî” û diyar kir ku piştgiriya diravî ji radyoya wan jî aliyê hin saziyên civaka sîvîl e”..

Radyoya WELAT jî li bajêr heye, ew radyo

girêdayî ye bi dezgeha Welat a ragihandinê, Mamoste “Mehmûd Kîkî” rêvebirê radyoyê ji kovara Welat re got: Radyo Welat di 14 heyva cehzeranê sala 2014 an de hatiye avakirin, li bajarê Qamişlo kar dike, 14 bernameyên radyoyê hene jibîlî nûçeyên Erebî û Kurdî û xwendina rojnameyan bi herdû



zimanên Kurdî û Erebî tê weşandin,  
 bêhtir radyo li ser bernameyên civakî û rewşenbîrî disekine,  
 herweha bernameyeke siyasî jî heye behsa rojeva siyasî li  
 Rojavayê Kurdistanê dike, peyama me di ragihandinê de ewe ku  
 bi hev re civakê bi riya ragihandinê pêşbixin”  
 “Kîkî”da zanîn ku radyo 24 seatan kar dike, û 11 karmend di  
 radyoyê de kar dikin, piştgiriya diravî ji aliyê sazîyeyeke civaka sivil  
 e, lê bi rengekî qels e”  
 Radyo alaveke resen û kevnar ji ragihandinê re ye, ew ji zehmetirîn  
 û girîngtirîn cûreyên ragihandinê ye di sedsala bîst û yekemîn  
 de, mercin taybet hene ji bo vî karî, û weke serhatiya Rojavayê  
 Kurdistanê roj bi roj hewldan tînin kirin ji bo pêşxistina ragihandinê,  
 bi taybetî ku zimanê dayikê yê Kurdî qedexeyê bû, nuha tîpa Kurdî  
 ya mûzîkî li bajarên Rojava bang li zimaneke resen û ragihandinek  
 azad dike..... ■  
 30/4/2015



انجبت طفلتها من جديد، فكيف ستتحمّل هذه المسكينة كل هذا العذاب إلى أن يحن عليها الطبيب ويقوم بولادتها وما ذنب هذا الطفل البرئ الذي سيولد ويأتي على هذه الدنيا، دنيا الغربة والعذاب والشقاء.

والسيدة زيتب تحدثت لمجلة ولات كيف دخلت إلى المشفى: (فعندما دخلت إلى غرفة الولادة كان فيها أكثر من عشرين امرأة والكل يصرخن ويتأوهن من الألم ولا أحد يأتي لمساعدتهن، فالطبيب متى يأتي؟ يأتي مع الممرضة عندما يسمع صراخ الطفل ليقول لها مبروك والممرضة تأتي لتأخذ البخشيش كأنها هي التي بذلت كل الجهد لحين ولادة الطفل).

ولسان حالهم يقول، ماكل هذا الظلم وماكل هذه المعاناة، ألأنا لاجئون أم جار علينا الزمن وجعلنا ننذل ونهان بعيداً عن وطننا، الأم، فهل سيحل عنا هذا القدر المشؤم ومتى....؟! ■

## الوضع الصحي في مخيم دوميز ومعاناة الحوامل.

ليلى محمد

### يواجه

اللاجئون في المخيم صعوبات كثيرة من جميع النواحي الاجتماعية والنفسية والصحية، فعلى الصعيد الصحي اوبسب الوضع الاقتصادي لللاجئين فهم يراجعون المستوصفات والمستشفيات المجانية للعلاج والطبابة عسى أن يخفف عبأً عن كاهل عوائلهم وتوفير ما تيسر لهم، ولكن هناك اهمال وفوضى في المستوصفات والمستشفيات دون رقيب أو حسيب، فإذا ذهبت إلى المستوصف ستجلس ساعات طويلة إلى أن يحين دورك ليكشف عليك الطبيب ويصف لك الدواء، فبعض المرضى مسنون لا يستطيعون عناء الانتظار لوقت طويل بسبب ضعف بنيتهم الجسدية اضافة إلى وضعهم الصحي المتدهور.

هذا حدث ولا حرج مقارنة بوضع ومعاناة النساء الحوامل اللاتي يواجهن الموت الحقيقي، فهن على وشك الولادة يتم تحويلهم إلى مشفى التوليد لتتم معالجتهم، وهناك لا يستقبلهم الطبيب ولا يعطونهم اضرابهم إلا إذا ذهبوا إلى العيادة الخاصة به ودفعوا معاينة وبعد ذلك سيحدد لهم من جديد موعد للولادة في المشفى هذا ما تحدثت به السيدة ربما التي



## Buhabûna sebzeyan li Qamişlo

Rodî Hemê

**B**azara Hal ya bajarê Qamişlo kevintirîn bazar e di nav bazarên Qamişlo de, ew di sala 1946an de di dema Ferensiyên de hatiye damezrandin.

Piştî astengiyên bazerganî li tevayî ya roj avayê kurdistanê destpêbûn, tevgera welatiyan li vê bazarê pir kêmtir bû, ji ber ku buhabûna sebze û şînkayê bi awayekî berbiçav bilind bû, gihiştîye astekê ku ew wêneya bazarê ya ku mişt welatî di demjimêrên sibê de wendabû ye.

Welatiyê bajarê Qamişlo gelek gazinan ji vê buhabûnê bikin, M. Selîm Elî mamosteyê dibistanê ye wiha axivî: "Ez nema dikarim wek berê sebzeyan bikirim, pirê caran ji hemû cureyên sebzeyan bi tenê ez nîv kiloyê dikirim, ma ezê çî bibêjim ku kiliwa bacanan gihiştîye 250 lêreyên sûrî, herwiha bacanê reş û îsot".

Ne bi tenê welatî xwedî gazine bûn, lê bandora vê buhabûnê li ser sebzeferoşan jî mezin bû, birêz Bavê Alan weke kevintirîn sebzeferoş li bazara Hal ya kevin li bajarê Qamişlo tê nasîn, diyar kir ku karê wan jî bi vê buhabûnê re pir qelis bûye û got: "Berî vê buhabûnê min rojane 1

ton bacanên sor tenê difrot, herwiha bêtirî 250 kilo ji hemû cureyên din jî, lê niha nema weke berê ye". Lê navê pîrsek xwe diyar dike, gelo sedema vê buhabûnê çiye? Ta ku em perseveke durist bibînin me berê xwe da Birêz Mustafa Ehmed, ew jî tê nasîn weke bazirganekî mezin di warê şînkayî û sebzeyan de, Birêz Ehmed wiha bersiv da: "Piraniya sebzeyên me ji bajarê Der'a tî, û ji Der'ayê ta Qamişlo bêtirî 15 rêbendên kontrolê hene, ji ber vê yekê dema ku her rêbendek 50.000 lêreyan weke gumrikê bistî ne bê guman ewê bihêle ku buhabûn zor bilind bibe, di heman demê de xwedanên kemyonan jî serê her barekî doza 200 hezar lêreyên sûrî dikin, ev sedema serekeye ji buhabûna sebzeyan re". Gelo ta kengî wê welatiyên Cizîrê di bin dilovaniya van kesan de bijîn? Me ev pîrsa han ji D. Salih Zobe'a

(serokê desteya çandinî û avdaniyê) kir, ew jî weke berpirsyarekî wiha axivî: "Di demeke nêzîk de emê dest bi pirojeyên giring bikin, ew piroje bê guman ji bo berjewendiyên welatiya ne, yek ji wan emê malên bilastîk bi awayekî ber fireh avabikin". Hêjaye gotinê ku Cizîrê navdare bi çandiniya sebzeyan li di demsala havînê de tenê.....



وإن الصيف يطرق الأبواب , كما يتم انتقال هذه الأمراض عن طريق البعوض والذباب .

هجمة العودة على المدينة دون اتخاذ تدابير واجراءات الوقاية اللازمة ستعرض المدينة لحرب صحية , دكتور بختيار حسين يحذّر من كارثة صحية قد تحلّ بالمدينين , ولا سيما مع قدوم فصل الصيف وافتقار المدينة لأدنى سبل الوقاية , يقول : في الوقت الراهن ونظراً لبرودة الطقس قد تكون هذه العوامل أقل خطورة , لكن في الغد القريب سنكون على احتكاك كبير مع أوبئة لا تقل شأناً عن الازهَاب والحرب نفسها , وسنرى التأثيرات الجانبية للأسلحة المستخدمة في كوباني من مشتقات اليورانيوم وكيفية تأثيرها السلبي على جيل كامل ولا سيما الأطفال وأمراض مثل الكوليرا , نظراً لانعدام الظروف الصحية لتصفية المياه والتلوث الحاصل في الأنوية والمجري المائية التحطمة والمتشابكة فيما بينها , السل لا يقل وبائية وخطورة مع تواجد الكثيف للعوامل المسببة مثل الغبار والأدخنة والشح في الطرق الوقائية .

يضيف قائلاً : للشمانيا ناجمة عن الحشرات المنتشرة على الجثث المرمية والمندثرة تحت الأنقاض , وانعدام السبل الصحية لانتشالها ودفنها , أضف إلى ذلك المواد المسرطنة التي ستكون ناجمة عن نوعية الأسلحة المستخدمة في كوباني . يرى دكتور بختيار حسين أن الحلول يجب أن تكون راديكالية الطابع وبسرعة فائقة بتدخل المنظمات العالمية المعنية والمدعومة بالعتاد الكامل لأخذ الاجراءات الوقائية , ويرى أن المناشدة تقع على عاتقهم هم الأطباء والسلطة المحلية في كوباني , يقول : أنا بدوري

من منبر ولات الاعلامي الموقر أناشد العالم للتدخل السريع لتدارك مثل هذه الكوارث , وكذلك أناشد السلطة المحلية في كوباني للتحرك السريع ودق نواقيس الخطر المحاط بالمدينة المنكوبة

## صحياً .... كوباني ليست على ما يرام

شيرين تمّو

**الحرب** الشرسة التي شنتها تنظيم داعش على مدينة كوباني , والأسلحة التي استخدمت فيها , ألحقت دماراً في كامل البنية التحتية والخدمية والصحية للمدينة .

الوضع الصحي أكثر خطورة مقارنة بمجالات أخرى , فمن المشكلات البارزة التي ظهرت على الساحة بعد تحرير كامل المدينة من تنظيم داعش انتشار أمراض وأوبئة خطيرة بين المدينين العائدين إلى المدينة , فالهواء الذي يستنشقه ليس نظيفاً , حيث أنّ كمية الأسلحة المستخدمة في مدينة كوباني تبقى تأثيراتها لمدة عشرة سنوات حسب بعض الهيئات الصحية , كما أن هناك خطورة على المولودين الجدد .

الجثث التي ما زالت تحت الأنقاض والتي كانت من المفترض أن يتم انتشالها , فبعد تساقط الأمطار وتسربها إلى الآبار التي يشرب منها المواطنين في كوباني , والتي هي غير صالحة للشرب فتسبب انتشار الملاريا والكوليرا حسب ما تأكده الهيئة الصحية في كوباني , كما أنّ انتشار الكلاب والجرذان التي تغذت على الجثث يسبب انتشار مرض اللشمانيا , خصوصاً





## Rewşa abûrî li Amûdê û zehmetiya jiyânê

Alan Alûcî



**B**ajarê Amûdê ji mêj ve ta îro, tê nasîn ku bajarekî normal e di rewşa xwe ya abûrî de, bê ku derfetên mezin ên pêşesazî û bazirganî lê peyda bibin mina: kargeh û kompaniyan, ew jî bi sedema ku rêjîmê nedixwest ku bajarokên kurdî di rewşa abûrî biserkevin, dêmek wan destûr û rêdan ji bo avakirina kompanî û kargehan li bajarên kurdî nedidan .

Tenê xelkên Amûdê bi berhemê çandiniyê ,û hin karên biçûk dikarîbûn jiyana xwe berdewam bikin.

Lê bi destpêka şorşa Sûryê, û berdewamiya şer dinav bera rêjîm û opozisyonê de, bandoreke xerab li rewşa xelkê ya abûrî kir û ta roja îro jiyana wan bi zehmetî berdewam dibe.

Bajarê Amûdê jî îro mîna gelek bajaran miletê wê di rewşeke xerab de ye, ji hêla abûrî ve, û dabînkirina pêdiviyên sereke yên rojane.

Ew jî bi sedema buhabûna bê wate, nebûna kar, dorpêçkirin, û veqetandina bajaran ji aliyê komên tundirew û tîrorist ve.

Lê şkestina lîreya Sûrî himberî dolar, bûye sedema herî mezin û ew nexweşiya xelkê a bê derman maye.

Li bazara Amûdê bazirgan û hemwelatî tev de gazinan dikin û her yek dilgiraniya xwe tînin ziman.

Bazirgan tewanbarin ji aliyê xelkê ve bi keysebaziyê ,lê bazirgan vê red dikin û ew dibêjin buhabûna kelûpelan ne ji cem meye wek bazirgana lê belê gelek sedem tên pêşiya me di dabînkirina wan, yek jê : Bazirganên mezin nema leyreya Sûrî bikartînin, kirîna bûye bi dolar û herkes dizane ku îro nîrxê dolar çawa bilinde, û her katekî bi nîrxekî ye.

Lê netenê dolare, belê metirsiya rê û girtina wê ji hêla çeteyan, û nepeydabûna hin alavên sereke li bazarê, ev hemû dibin sedema buhabûnê.

Li himber wê hemwelatî jî tînin ziman: raste ku dolar bûye sedema buhabûnê lê bazirgan jî nepabendin bi ketina dolar, tenê di buhabûna dolar de nîrxê kelûpelan bilind dikin, ew qet rewşa xelkê ya xerab nayinin ber çavên xwe.

Her wiha xelkên Amûdê gotina li ser zimanê wan maye eve: (sal bi sal xweziya me bi par).

Pirsa wan gelo: wê kengî ev kirîz bidawî bibe, û aramî vegere bajarên me?

wek ku me diyarkir ev alozî û ji alîkî din tunebûna kar bû sedem ji koçberiya bi hezaran ji malbatên Amûdê ber bi welatên din ve, ta ku jiyana xwe ya mayî di xweşiyê de derbasbikin, lê ev jî di be metirsî û dikeve xizmeta valakirina bajarên me de. ■

## Kêşeya Koçberiyê li Hesekê...

### Raman îsa

**D**i demên derbasbûyî de diyardeya Koçberiyê li bajarê Hesekê Zêde bûye, rojan e welatîyên kurd ji bajêr koçber dibin, nexasim sedemên vê Koçberiyê jî berçav in, mîna rewşa Abûrî ya xerab, û têkçûna Ewlehiyê, li gel rewşa bajar ya tevlihev, ev rewş bi tevahî bandora xwe li ser jiyana welatîyên sîvîl dike.

Ji aliyekî din ve, ji ber tunebûna derfetên kar, beşek ji welatîyên bajêr neçar man ku malên xwe bifroşin û ber bi turkiyê û başûrê kurdistanê ve herin, herwiha beşek ji wan li Ewropayê penaber in .

Mijara koçberiyê ji 5 salan û virde li sûriyê bi giştî zêde bûye, lê di herdû salên dawî de li herêmên kurdî û piştî dorpeçkirina rêxistina Da'îşê li derdora gundewarên Hesekê yê başûr û rojava, ji hêlekê ve bi taybet her du gundên kurdan ( Refref û Um Elkihêf ) dema ku êrişê Da'îşê ya dawî ji aliyê başûr ve rûda, xelkên her du gundan rastî tendûtûjiya çeteyan hatin û ji neçarî mal û milkên xwe berdan û koçber bûn, bê guman gefên rêjîmê û mîlîşyeyên wê li dijî kurdan ji hêleke din ve, sedemek e sereke ye ji koçberiyê re. nemaze piştî Komkujiya Newrozê ya ku ji encamên wê bi dehan şehîd ketin û

bêtirî 150 kesî birîndar bûn, piştî wê bûyera xemgîn, asta koçberiya kurdan ji Hesekê bilind bû.

Li gor nerîna hin şirovekarên siyasî, diyare ku ev koçberî ne ji ber rewşa abûrî ye û jî ji ber têkçûna Ewlehiyê ye, lê tê gotin ku kesin hene kar dikin û pîana datînin, da ku li seranserî herêmên Kurdî valahî ji kurdan çê bibe, ji xwe di heman dema ku kurd malên xwe difroşin, li gelek deveran kesên Erebi li Şûna wan cih digrin, ev yek tê wateya guhertuna demografiya herêmên Kurdî bi şeweyekî pîlankirî.

Debarê diyardeya koçberiya kurdan û di hevdîtineke taybet de li gel Kovara welat, welatîyê Kurd ê bi navê " Ehmed Bavê Semîr " anî ziman ku ji despêka Qeyrana Sûriyê ta neha, Kurd ji rojavayê kurdistanê koçber dibin, lê ya herî balkêş ewe ku di sala bûrî de, rêjeya koçberiya kurdan pir bilind bû, û ez bawer im ku sedema sereke ji vê diyarde ye re, nakokiyên ku di navbera aliyên siyasî de hatine Afirandin.

Koçberiya kurdan ji bajarê Hesekê bûye cihê metirsiyekê li nik welatên Kurd yê mayî di bajêr de, û li gor helwesta welatîyên sîvîl, dê ev koçberî bandoreke xwe ya neyînî li ser guhertuna demografiya herêmên kurdî bike, Eger çareseriyek ji vê kêşeyê re neyê dîtin, dê hebûna kurdan bi xwe di metirsiyê de be. ■



## Rewşa Tirbesipiyê

### Haydar Sifûk

**B**uhar berî çend salan li Tirbesipiyê serfiraz dihat bi simbil û ava xwe , vê salê buhara Kizberayê ye ! simbilên genim winda man li ber payiza welat ji êşkenceyên peydakirina pêdiviyên vî keskeyî .. Kizbere û Kemûn daxwaza barê giran ji cotkar û haydarên xwe qet nakin , dimînin li ber dilovaniya Yezdan bi tenê , lê belê genim insûrên wê yên gerek pir in : av , semad , hayîbûn û tevî wisa jî cotkar dide ber çavên xwe gengaza ku baran heye kêmi gerekiya vî genimî be , wê demê mazot dikeve riya wî de û ew jî buha ye li gor aboriya her cotyarekî û bê goman pisgirêkên motorên avê ew jî barekî ne hindik e lê ji nêrîna milê pêşeroja rewşa xaka çandiniyê ; guherîn baştir e ji ber ku insûrên tên qedandin di wî beyarî de di dema genim de wek mînak bi berhemekî guherî re dîsa

amede dibin .. çemê Cerehê yê ku di nîvê Tirbesipiyê de dibûrî .. mexabin çikî , Turkan av ser qut kir û baran jî êdî ne mîna berî pîst salî ye , bav dibêjin şopa Cerehê wê demê tev dar , kulîlik û nêrgiz bûn , wek ku perika nîgarvanan wêneyekî ji buhiştê saz bike , niha ew şop maye kort xelkên derdorê gilêşê tê de diçênin !! berê .. Tirbespî wek ku yek ji bajêrên mezin yên kurdan bû , zeviyên derdorê difûrî bi xort û keçên xwe yê ku ji serê sedî heya bi 80yî jî dûr çûn li başûrî welat , li bakurî wî , li Turkiyê , li Lubnanê û deverên Ewropa yê demsalên xwe derbas dikan .. ji lewra buhara Tirbesipiyê xemgîn û dilzar e ji bilî şewtandinkên Petrolê yên li başûrî bajêr pêktên li gundên 'Ereban ku rewşek ne tindurist dan vî bajêrê birîndar .. tenê wek geleya dilovaniyê di singa rebenê êsîr .. dîsa wek pîr û kalan berê gotî: " war ew war e , lê buhar ne ew buhar e " ■



## Çandinî li bajarê Derbêsiyê (Rojava yê Kurdistanê)

Hûsên Al Sîno



Lê dîsa gûndî razîbûna xwe nîşan dikin ku Baran û him alav jî bi pir bûn hene.

Tê gotin ku bajarê Dirbêsiye û gûndewarên wê bi çandina ( Genim, Pembo, Ceh, Kemon û Nîska navdar e. ■

**D**ema ku mirov li ser rewşa çandiniye li Rojavaye kûrdistanê û bi taybet li bajarê Derbêsiyê di sala bûrî deraweste, ku alav pêdiviyên tune bûn, him jî buhaûna hemî cureyên sotemeniyê û dûvçlikên wê, bi ser de jî kêmbûna avê, ziyaneke pir mezin alava ghişt cotyar û xwedan alavan.

Lê bê gûman, diyare ku îsal çandinî bi Xêre û gûndî û cotyarên Derbêsiyê şad û dilxweş û pextewerin, ku berê salê li xêrê ye.

Wek tê zanîn ku sala 2015 ne wek salê bûrye ji temenê şoreşa sûrye û ji ber bûha û giraniya nîrxê çîwalên vala, ku nerx, çewalê vala ( 240 ) lîre ye, û Tona Semad bi ( 110 ) hezar lîre ye, û bermila sotemenyê bi ( 7 ) hezar lîre ye.



، ومرتفعات جبال زاغروس إلى البحر السوري في الغرب ، ووقع قلبها في منطقة الخابور حيث أنشأت عاصمتها " واشوكاني(2) ، وبعد أن ضعف حكم "الميتانيين" تمكن ملك آرامي يدعى (كابارا) أن يبني دولة جديدة على أنقاض دولة "الميتانيين" وجعل من "تل حلف" عاصمة له سميت "غوزانا"، إلا أن هذه المملكة الآرامية لم تعمر طويلاً فقد قضت عليها "الدولة الآشورية" وبقيت المدينة تحت سلطتهم حتى تمكن "الميديون" الذين يعتقد الباحثون أنهم أحفاد "الميتانيين" من استرجاعها أثناء توسعهم نحو الغرب، ومن بعدهم "الساسانيون" وقد ظهرت جدران عليها تزيينات "ساسانية" بين الآثار التي كشف عنها التنقيب، وظلت هكذا حتى غزاها "الروم" عام 943م ونهبوها واستاقوا منها عدداً كبيراً من الأسرى، واحتلوها وأصبحت "رأس العين" تحتل مكاناً مرموقاً على الحدود البيزنطية وعلا شأن "رأس العين" مرة أخرى حتى أضحت كأنها مملكة لها شخصية اعتبارية داخل الإمبراطورية الرومانية، وقد برز من علمائها ومفكرها الفيلسوف "سرجيوس الرأس عيني" وهو أول من ترجم الكتب الفلسفية والطبية من اليونانية إلى اللغة السريانية في القرن السادس الميلادي، وسميت رأس العين حينها "رش عينو".

كما سميت قطافة الزهور "قطف الزهور" ، وعين الورد كما ورد في معجم البلدان لياقوت الحموي ، حيث تحدث عن ينابيعها وعذوبة مياهها (3).

المراجع: 1- الأديسي ، نزهة المشتاق 2-- دكتور حمة فؤاد خورشيد ، الكورد في المصادر القديمة 3-- ياقوت الحموي ، معجم البلدان 4-- موسوعة ويكيبيديا الالكترونية .

## رأس العين " وأسمائها السبعة "

محمد مير سعادة

### تحدث

عنها الإدريسي في كتابه نزهة المشتاق قائلاً "رأس العين مدينة كبيرة فيها مياه نحو من ثلاثمائة عين عليها شبك حديد تحفظ ما يسقط فيها، ومن هذه المياه ينشأ معظم نهر الخابور الذي يصب في قرية البصرة(1).

تاريخ الحضارات يعقب في رأس العين فإنها وتل حلف وتل الفخيرية، هذه المواقع الثلاثة حالياً هي مواقع متصلة ضمن دائرة لا يتجاوز قطرها 2 كم، ضمن حدود مدينة "رأس العين" وأول من غامر بالتنقيب فيها هو العالم الألماني "ماكس فون أوبنهايم" في مطلع القرن العشرين، و أقدم مظهر حضاري يصادفنا هو ما باحت به المكتشفات الأثرية في "تل حلف"، فقد دلت على وجود شعب عُرف باسم "الشعب السوباري" وهم من الشعوب الآرية "الهندو أوروبية"، وكانت عاصمة الدولة التي شكلها "الشعب السوباري" هي "تل حلف"، ويعود ذلك إلى حوالي الألف الخامس ق.م، ومن ثم عاودت النهوض من جديد ، حيث شكلت دولة في الجزيرة امتد نفوذها وسلطانها إلى الأقطار المجاورة، وهي الدولة "الميتانية" حيث ذكرت المراجع أن دولة ميتاني تأسست وتآلق نجمها وتوسعت ، واشتهرت كإمبراطوية فيما بين عام 1500 و1360 ق.م ووصل حدودها في فترة أوج عظمتها من سهول كركوك " أرابخا القديمة " جنوباً





## Vîtamîn çîye

**Dr. Abdulwahab Hacî**

Vîtamîn gûrzek ji levsîwarîyên kîmîkîne  
 „giranîya wan ya atomiyane pir sivike  
 Vîtamîn ji sê atoman pêk tên , ji:

1-yek atom Haydrocên.

2- yek atom karbon.

3-yek atom oksîcên û car caran hin mîtal ]  
 kirîsteyên din jî dikevin avakirina wan de  
 Weke tê zanîn ku beşekî mezin ji vîtamîn  
 di riya xwarin û vexwarina rojane ya mirov tê  
 misogirkirin.

Bi giştî vîtamîn dû karên giring û sereke di  
 laşê mirov de pêktînin:

Parastin û bilindkirina hêzên sîstêma.

1- berxwedana laşê mirov

2-Parastina laşê mirovan ji gelek  
 nexweşîyên taybt yê ku bi kêmbuna  
 vîtamînan ve girêdayî ye.

Vîtamîn di sala 1881an ji hêla zanistê  
 navdar ( LUNÎN ) ve hatine naskirin,di sala  
 1912 an de zanist (FUMK ) dikarî vîtamînan  
 wek beşekî taybet ji levsîwarîyên kîmîkî ji nav  
 hemî levsîwarîyên kîmîkî yê din veqetîne û

navê wan kire Amînên jîyanê

Cûdahîya levsîwarîyên vîtamînan ji levsîwarîyên kîmîkî  
 yê din:

1-Vîtamîn di xwarin û vexwarinê de bi awakî pir hindik  
 peydadibin.

2-vîtamîn Na bin beşek ji beşên avakirina  
 tevnên laşê mirov. bi wateyeke din,ew ne wek  
 profîn,don,ûkarbohîdratan ne ) yê ku dibin bingeh ji bo  
 avakirin û sazkirina tevnên hemî sîstêmên laşê mirov.

3-vîtamîn ne wek (don û karbohîdratan û şekirin) yê  
 dema di laşê mirovde dişewitin tên herivandin hêzû taqet  
 derdixin.

Kêmbuna asta vîtamînekî taybet di laşê mirov de,dibe.

4- sedema nexweşîyek taybet

5-vîtamîn wek kirîstyên alîkar di laşê mirov de  
 tê naskirin,ew dibin alîkar di rêk û pêkirina hemî  
 levsîwarîyên kîmîkî yê ku di laşê mirov de çêdibin.

Bi giştî em dikarin vîtamînan wek dû beşan bidin zanîn:

1-Vîtamînen ku di nav don de tên helandin ( fat soluble  
 vitamin)

wek , vît. A. . vît .D. vît. E . vît. K

Vîtamînen ku di nav avê de tên helandin (water soluble  
 vîtamîn ) wek gurûpa vîtamîn B B1,B2 , B3 , ..... B6  
 u B12. ) û vîtamîn C ■



## Xweşnav Heso

### Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

### PEYVA WENDAYÎ

( eman dilo-eman dilo-ji derdê-yarê-dil-bû-bi kulo-min bihîstî-tu-nexweşe-dilo-çikim-bextê-min-tim-reşe-dilo-welat).

Î	G	O	L	I	D	N	A	M	E
T	J	R	E	Ş	E	O	L	I	D
S	E	I	I	R	W	E	L	A	T
Î	K	M	D	Ç	I	B	K	I	M
H	T	U	A	E	Ê	T	X	E	B
Î	M	Ê	L	N	R	D	I	L	O
B	I	D	I	L	D	D	E	G	T
N	N	Y	A	R	Ê	I	Ê	Ê	I
I	B	I	K	U	L	O	L	B	M
M	N	E	X	W	E	Ş	E	O	Û

Peyva wendayî ji 9 tîpa pêktê,nave bajarekî Kurdî ye.

--	--	--	--	--	--	--	--	--	--

Bersiva jimara bûrî : BEDIRXAN

### XAÇERÊZ

Rast :

- 1-mamoste .
- 2-komarek Asyayî ye-torbeyên ku pembo tê dimînin.
- 3-berî du salan-jimara piştî 29an.
- 4-awayê xwendin û perwerdeya binind.
- 5-du tîp ji peyva Diran-bapîrên Kurdan.
- 6-cîhok an jî çemê biçûk.
- 7-navekî keçan e.
- 8-hêsanî – çandir.

1	2	3	4	5	6	7	8
1							
2							
3							
4							
5							
6							
7							
8							

Serjêr

- 1-navê çiyayekî Kurdistanî-xak.
- 2-pişaftin.
- 3-birîndar bi zimanê Turkî- Xiyar bi Kurdî.
- 4- çar tîp ji peyva Dendank-bajekî Elmaî ye.
- 5-gihayek bi bêhn e.
- 6-gêrgêrik.
- 7-Dîl bi zimanê Erebî-berî 24 demjimêran.
- 8-hozek li rojhilatê Qamişlo ye-paşnavê helbestvanekî Kurd e.

		5	3	2			
8							2
	7			1		5	3
4					5	3	
	1			7			6
		3	2				8
	6		5				9
		4			1		3
5					9	7	

Bersiva jimara bûrî


8	2	4	5	7	3	9	1	6
1	7	3	2	6	9	8	4	5
6	5	9	4	1	8	2	7	3
7	3	6	1	8	2	5	9	4
5	8	1	9	4	6	3	2	7
9	4	2	3	5	7	1	6	8
3	1	8	7	9	4	6	5	2
4	6	5	8	2	1	7	3	9
2	9	7	6	3	5	4	8	1

Bersiva jimara bûrî

1			A	V	D	A	R
2	Ş	O	M	A		R	Û
3	Î	C			N		T
4	N	E	S	R	Î	N	
5		L	A	N	D	I	K
6	Ç	A	R	H	A	W	E
7	Û	N		A	K	A	R

### PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

- 1-Heger dîn be,bila dînê dê û bavê xwe be!
- 2-Bi destekî dide,û bi destekî distîne!
- 3-Axîna poşmanan li dawiyê tê!
- 4-Kesê ku gelekî razê,ewê nanê wî kêm be!
- 5-Gepa necûtî nare xwarê!
- 6-Dijminê bi rext çêtire ji destê bêbext!
- 7-Bi derziyê bîr naye kolan!
- 8-Malê xesîs û comerdan wek hev diherin!
- 9-Îro bi qurmana do be!
- 10-Gurî bûye axa!



welatpress2014@gmail.com  
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

**Welat**

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٢١) ٢٠١٥/٦/١